*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd*
*di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (516) 20-04-2026



## Başûrê Kurdistanê, lîstikvanek ku êdî di hevkêşeya petrol û siyaseta cîhanî de nayê paşguhxistin

**N. Eskender Ceiferî** Di salên dawî de, navê Başûrê Kurdistanê ji her demê bêtir li kêleka têgehên wekî wize, bazara cîhanî ya petrolê û pêşbaziya jêopolîtîk hatiye baskirin.
Geşedanên têkildarî henardekirina petrolê li herêmê, bi taybet di dema serokatiya Donald Trump de, nîşan dane ku Kurdistan êdî ne tenê lîstikvanek herêmî ye, lê di heman demê de bûye beşek ji hevkêşeyên mezintir li ser asta navnetewî.

**Dom» R:7**



## Komara Îslamî Versiyona 2.0

**N. Dr. Mecîd Heqî** Em îro li nuqteyekê sekinîne ku dûmana şerê çilrojî ketiye û cesedê fîzîkî û manewî yê Elî Xaminêyî û beşekî mezin ji kadroyên teokrasiya desthilatdar, di bin kavilên vê pevçûnê de hatine veşartin. Lê tiştê ku di vê serdema “agirbesta hejok” de tê dîtin, ne veguherînek dumoqratîk e, belkî jidayikbûna cinawirekî ye ku ez jê re dibêjim “Komara Îslamî; Versiyona 2.0”.

**Dom» R:9**



## Krîza jîngehê li Îranê: Dema ku av û hewa dibin pirseke siyasî

**N. Sefiye Xalidî** Krîza jîngehê li Îranê ji ber rewşa niha her ku diçe dibe yek ji pirsgirêkên herî girîng ên welêt û êdî ne tenê pirsgirêkek ekolojîk e. Kêmbûna avê, qirêjiya hewayê ya zêde û qutbûna elektrîkê ya dubare bandorê li jiyana rojane ya mirovan dike û dibe sedema zêdebûna nerazîbûna raya giştî Kêmbûna avê ji bo gelek herêman dibe sedema pirsgirêkên mezin.

**Dom» R:10**



# Hizba Demokrat: Parastina Rewa wek mafê xwe yê rewa dibînin




Em xelkê Kurdistanê û raya giştî ya navneteweyî agahdar dikin ku danê nîvroya roja 28ê Xakelêweyê, careke din rejîma mirovkuj a Komara Îslamî, ku ji ber şerên vê dawiyê di lûtkeya lawaziya xwe de ye, di encama tirs û xofa hertimî de ji hêz û rewayetiya xebata rizgarîxwazane ya Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê, serweriya axa Herêma Kurdistanê di dema agirbesteke du hefteyî ya bi Îsraîl û Amerîkayê re binpê kir.
Rejîma Komara Îslamî ku di dema mehek û nîvên derbasbûyî de zêdetirî 107 caran bi mûşek û dironan êrîşî ser kampên Hizba Demokrat kiriye, di berdewamiya destdirêjiyên xwe de careke din êrîş kir ser kampa penaberên sivîl ên Rojhilatê Kurdistanê li “Cêjnîkan” a nêzîkî bajarê Hewlêrê, her wiha komek ji pêşmergeyên Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê kir armanc. Mixabin di encama van êrîşan de du pêşmergeyên keç bi navên “Neda Mîrî” û “Semîra Ellahyarî” û Ciwanek bi navê “Şahîn Azarberzîn” (kurê malbateke pêşmerge) şehîd bûn û du pêşmergeyên din jî birîndar bûn.
Komara Îslamî wek adetê xwe yê hertimî, dixwaze tola şikesta xwe ya leşkerî, siyasî û ewlehî ya li hundur û derveyî welat, ji xelkê Kurdistanê û tevgera wê ya rewa bi êrîşkirna ser kamp û baregehên Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê bistîne bistîne. Bi tekezî ew rejîm bi peykerekî wêran û hilweşiyayî ve, zêdetir ji her demê di hember îradeya gelê Kurd li Kurdistana Îranê de tûşî şepirzebûn û serlêşêwayiyê bûye. Ew rêjîma ku tu carî pabendî bingehên mafên mirov û peymanên navneteweyî nebûye, çavnihêrî jê nayê kirin ku di dema cankişandina xwe de dest ji xelkê sivîl û wan kampan biparêze ku xelkê sivîl tê de dijîn.
Hizba Demokrat ligel ku bi şanazî ve di astê êrîşên bêrehmane yên rejîmê bo ser xelkê Kurdistanê de xebata pêşmergane kiriye û berevanî ji man û nasnameya neteweya xwe kiriye, lê belê her dem alîgirê çareseriya aştiyane û siyasî ya pirsa Kurd bûye û ji bo rexsandina derfeteke wiha jî nirxên mezin daye, lê belê wê rejîmê bersiva hemû hewlên wiha bi mûşekbaran, teror, sêdarê û serkutkirinê daye.
Em tevî şermezarkirina van êrîşan, radigihînin ku Komara Îslamî ya Îranê di dema derbasbûyî de berdewam rêkeftinnama ewlehî ya xwe ligel Iraqê binpê kiriye, bi vî awayî em jî parastina rewa wek mafê xwe yê rewa dibînin. Hevdem daxwaz ji navend û civatgeha navneteweyî, welatên demokrat û dostên me yên li hundur û derveyî Kurdistanê dikin ku, di nav pirsa bazara neftê û çekên etomî de, pirsa neteweyên cuda yên Îranê û di serweyî hemûyan de pirsa Kurd û xebata wê ya demokrasîxwazane ji bîr nekin û lêpirsînê ji van êrîşan bikin ku li ser kampên Kurdên Rojhilat, dibistan, nexweşxane, goristan û navendên sivîl tên kirin. Hûn dikarin van kiryarên wan wek “tawanên şer” bidin nasîn û hevdengiyekî navneteweyî ji bo parastina xelkê sivîl pêk bînin û cezayên giran û bacê bixin ser kiryarên rejîmê û derfeta bikaranîna mûşek, diron û kiryarên terorîstî jê bistînin.
Tevî sersaxî ji malbat û kesûkarên şehîdên me yên herî dawî, em hevçeperên wan û hemû gelê Kurdistanê xatircem arxayîn dikin ku êrîşên tirsonekane yên Komara Îslamî, hinde dine zêdetir me bo gihîştina bi armancên gelê Kurdistanê û berdewamiya xebatê mukumtir dike.

Wek caran bi îradeya têkoşerên Demokrat û piştevaniya bêdawî ya xelkê Kurdistanê, emê di xebata xwe ya mukum de berdewam bin û rêbaza hemû şehîdên gelê xwe bidomînin.

**Navenda Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê**
**28ê Xakelêweya 1405a Rojî**

# Beşdariya Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat di civîneke Parlemana Ewropayê de



Roja çarşemê, 26'ê Xakelêweya 1405'an a rojî, Parlemana Ewropayê mêvandariya civîneke siyasî kir ku bi amadebûna hejmarek ji kesayetiyên opozîsyonê û nûnerên partiyên siyasî yên neteweyên nava cografyaya siyasî ya Îranê hat lidarxistin. Di vê civînê de daxwazên beşên cihêreng ên civaka Kurdistan, Ahwaz û Belûçistanê di yek ji navendên herî girîng ên siyasî yên Ewropayê de hatin pêşkêşkirin.

Ev civîn bi beşdariya lîderên Kurdistan, Belûçistan û Ahwazê derbarê paşeroja Îranê ya piştî rejîma Îslamî û pêwîstiya damezrandina sîstemeke demokratîk û federal li ser bingeha pluralîzm û sekularîzmê, ji bo cîbicîkirina demokrasî û azadiyê li Îranê, birêve çû.
Di vê rûniştinê de, Kak Mistefa Hicrî (Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê), Kak Ebdulla Mohtedî (Sekreterê Giştî yê Komelaya Şoreşger a Zehmetkêşên Kurdistana Îranê), Xanim Muna Sîlawî û Birêz Nasir Belîdeyî wek kesayetiyên naskirî yên siyasî beşdar bûn û gotarên xwe pêşkêş kirin.

**Mistefa Hicrî li Parlemana Ewropayê: Ji bîr nekin ku Kurdistan dergûşa tevgera "Jin, Jiyan, Azadî" ye. Ev nirx li cem me prensîp û hişmendiyeke avaker in, ne tenê dirûşm.**

**Deqa gotara Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistanê li Parlemana Ewropayê**

**"Silav li we bin birêzan, amadebûyên hêja, birêz endamên parlemanê!**
Pêşî dixwazim spasiya we bikim ji bo vê fersendê ku we em, anku beşek ji opozîsyona Îranê, vexwendin daku em ji vir dîtin û nêrînên xwe derbarê îro û sibeya Îranê bînin ziman. Hêvîdar im ev gava yekem be û di civînên din de em bibin şahid ku hejmareke zêdetir a hêzên opozîsyona Îranê ji bo axaftina li ser dîtinên xwe li vir kom bibin.
Ew yek ku min xwest bi zimanê kurdî bi we re bipeyivim, ji wê rastiyê tê ku zimanê me zêdetirî 100 sal in li Îranê tê înkarkirin û bi fermî nayê naskirin. Yanî zarokên me îzn çinebûne ku bi zimanê dayika xwe bixwînin û binivîsin; lê îro ez li vir bi wî zimanî diaxivim daku para min a piçûk hebe di xebata ji bo bi-fermî-naskirina zimanê dayika xwe de.

**Birêzan!**
Ev cara sêyem e ku Îranî ji bo avakirina demokrasiyê xebatê dikin; bi wê wateyê ku xelkê nava çarçoveya cografyaya siyasî ya Îranê di hewleke berdewam de ne ji bo gihîştina bi azadî û rizgariyê, lê mixabin heta niha bi ser neketine. Ji dîtina Kurdistanê û bi taybetî Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê ve ku ez nûnertiya wê dikim, kêşeyeke bingehîn li Îranê heye, ew jî dewleteke namedenî û yekdestxwaz e ku rê li ber her cure azadiyekê girtiye.

Li Îranê du caran dewlet ji rêça medenî derketiye: Carekê piştî Şoreşa Meşrûteyê ku li wir nîzama paşatiyê dewlet kir sîstemeke yekdestxwaz, û cara duyem jî ji sala 1979'an û vir ve, nîzama olî dewlet kir amûra yekdestxwazî û birêvebirina îdeolojiya xwe.

Di serdema paşatiyê de, nasnameya farisî dewlet bi kar anî daku hemû cihêrengiyan ji holê rake û tenê yek nasname, tenê yek ziman, tenê yek dîrok û tenê yek çandê li ser yên din ferz bike û wan asîmîle bike; di demekê de ku Îran welatekî pirziman, pirnasname, pirçand û pirdîrok e.

Di sala 1979'an de careke din Îranî bi hêviya avakirina sîstemeke demokratîk rabûn, lê vê carê dewlet ji aliyê ola Şîe ya Welayeta Feqîh ve hat kontrolkirin û wê jî hewlên xwe bo ji navbirina azadî û cihêrengiyên nava Îranê xistin ger.

Îro em dibînin ku dewleta Îranê ne tenê metrsiyek e bo Îraniyan, belku metrsiyek e bo hemû cîhanê.
Modela me ya Kurdistanî, beriya her tiştî kontrolkirina yekdestxwaziya wê dewletê ye. Bi awayekî diyarkirî, em dixwazin dewlet bin destê hemwelatî be, ne ku hemwelatî bin destê dewletê be.

**Mekanîzmaya me bo wê şêwazê hikûmraniyê, nîzameke demokratîk, federal û sekular e. Li vir hêz di navendekê de kom nabe û dikare yekdestxwaziya dewletê kontrol bike.**

Em vê yekê tenê wek çareserî dibînin bo avakirina Îraneke demokratîk, azad û sekular ku li wir Îran bibe milkê hemû niştecîhên xwe, ne milkê grûpekê.

Li hemberî vê daxwazê, rejîmên paşatiyê û piştî wê Komara Îslamî, ji bo parastina totalîtarîzm û yekdestxwaziya xwe, ev daxwaza demokratîk û pêşketinxwaz wek 'serxwebûn-xwaziya' wan neteweyan pênase kirine û bi wî sûçî bi sedan hezar kes îdam û zîndanî kirin e, yan jî neçar kirine ku di bin zexta serkutê de welatê xwe Terik bikin û bibin penaber.

Ev di demekê de ye ku ezmûna dinyaya pêşketî nîşan daye ku rêzgirtina ji cudahiyan û bi fermî naskirina wan, ne ku nebûye sedema parçekirina welat, belku tam berevajî, bûne sedemên herî bi hêz ên yekgirtina bi dilxwaz û parastina welat û niştiman.

Yekgirtina ax û niştiman wê demê pêk tê ku hemû pêkhateyên cihêreng di birêvebirina îdareya welat û herêmên xwe de beşdar bin û bi wî rengî welat bibin pêş, ne ku grûpek di bin serkut û tundûtîjiyê de hemû welat bo xwe dagir bike û yên din bixe qeraxê.

Tevgera me pişta xwe bi van nirxên mirovî girêdaye û dixwaze berevajî her du rejîmên Pehlewî û Komara Îslamî, seranserê Îranê tevî Kurdistanê jî bibe navenda aramî û peywendî bi cîhana azad re.

Ji bîr nekin ku Kurdistan dergûşa tevgera 'Jin, Jiyan, Azadî' ye. Ev nirx li cem me prensîp û hişmendiyeke avaker in, ne ku tenê dirûşm.

Tevgera me jî di çarçoveya van nirxan de xwe pênase kiriye, lewma em fikrê li çewsandin, nearamî û nebûna asayîşê nakin, belku bo pêkanîna wan hewl didin; meger ku careke din hewl bidin me ji nav bibin.

Di dawiyê de, bi navê hevpeymaniyê û bi taybetî Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê ve spasiya we dikim bo vê fersendê û di dawiyê de heke dem hebe, em dikarin dîsa mijarên xwe dirêj bikin.

**Spas bo her aliyekî.**

# Mistefa Hicrî: Bi vê rejîmî re dîplomasiya bêdeng nekin, çimku şerîyetê didê

**Kak Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê, di berdewamiya serdana xwe ya dîplomatîk a ji bo Ewropayê de çû Îspanyayê û beşdarî civîna "Hevpeymaniya Pêşvero" (Progressive Alliance) li Barselonayê bû.**




Di vê civînê de ku bi beşdariya bi dehan serokwezîrên welatên Ewropî, serokên partiyên Ewropî, Sosyal Demokratên Ewropayê, çalakvanên siyasî û medenî, nûnerên sendîkayan, rojnamevan, lêkolîner, nivîskar û nûnerên partiyên siyasî yên ji çar aliyên cîhanê pêk hatibû, Sekreterê Giştî yê Hizbê gotarek pêşkêş kir.

**Ev deqa gotara Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat e di vê civînê de:**

**Dostên hêja!**

Spas bo vê derfetê. Ciyê şanaziyê ye ku ez li pêşberî civîneke pêşverûxwaz rawestiyam e ku dizanin xebata ji bo demokrasiyê li welatekî, xebat e ji bo demokrasiyê ye li her derê.

Min silava Kurdên Îranê ji bo we aniye. Neteweyek ku nêzî nîv sedsal e li beramberî dîktatoriyê li ber xwe dide û di pêşengiya xebata ji bo demokrasiyê de ye li Îranê.

**Rêzdaran!**

Cîhan bi zimanê dosyayên etomî û bihayê neftê behsa Îranê dike. Bi kêmî behsa Kurd, Belûç, Erebên Ehwazê, jinên girtî yên Evînê, wan karkerên ku grevên wan tên şikandin, êşkence, darvekirin an komkujiya xwepêşanderên aştîxwaz dike.




Îran ji bo welatiyên xwe zindaneke tijî êşkence ye; aştî û îstiqrar li herêmê û cîhanê bi bê demokrasiyê di Îrana pêşerojê de ne sanahî ye. Naskirina vê rastiyê divê di pêşya karên hêzên pêşverû yên cîhanê de be.

Di demekê de ku şerê navbera Îran û Amerîkayê Rojhilata Navîn ji nû ve ava dike, metirsiya li ser Hizba me (Partiya Demokrat) û gelê Kurd tu carî wekî niha nebûye.

Em ne tenê ji aliyê rejîma Îranê ve, di heman demê de ji aliyê komên proksî yên Îranê ve jî bi gefan re rûbirû ne û metirsiyeke mezin li ser me çêkirine.

Ji dawiya meha Şibatê ve (February), Îranê zêdetirî 100 caran bi mûşekên balîstîk û dronan êrîşî partiya me kiriye. Êrîşên li ser kampên partiya me; nexweşxane, dibistan, malên sivîl û jêderên av û elektrîkê kirine armanc.

Tevî van hemûyan jî, armanca me ev e ku em pêşeroja hemû neteweyên cihêreng ên Îranê bixin navenda guftûgoyên navneteweyî, beriya ku hinekên din bêyî me biryarê li ser çarenivîsa me bidin.

Ji bo pêkanîna vê yekê jî, divê em alternatîfekê ji bo rejîmê pêşkêş bikin. Me ji meha Şibatê ve ligel aliyên din ên siyasî yên Kurd, "Hevpeymaniya Partiyên Siyasî yên Kurdistana Îranê" ava kir. Herwisa em mijûlî guftûgoyê ne bi komên din ên opozîsyona Îranê re bi giştî.

Eva jî bi hêviya avakirina alternatîfeke demokratîk e ku hêjayî qurbaniyên hemû wan xelkên Îranê be ku ji aliyê vê rejîmê ve hatine kuştin, girtin û êşkencekirin.

Ev erkê me yê herî girîng e û hûn hemû jî dikarin roleke girîng di vê pêvajoyê de bilîzin.

Em nehatine daxwaza xêrê bikin. Em daxwaza hevxebatî û hevkariyê û piştgîriyê dikin; ji wê curê ku rojekê pêşverûxwazan pêşkêşî "Kongreya Neteweyî ya Afrîkayê" (ANC) kir li Afrîkaya Başûr. Bi pêkanîna van 3 karan bi awayekî konkrêt:

**1- Naskirina siyasî:** Dengê me di parlamenên xwe de, di Parlamena Ewropayê û di Neteweyên Yekbûyî de bilind bikin.

Bipirsin: Gelo çi hat serê Kurdan? Gelo girtiyên siyasî çi lê hatin? Gelo darvekirin? Bi vê rejîmî re dîplomasiya bêdeng nekin, ji ber ku ev tenê xizmeta rejîmê dike û rewayî û şerîetê dide rejîmê.

**2- Daxwaza lêpirîn û lêkolînê bikin:** Ji bo wan êrîşên ku li ser penaberên siyasî yên Kurd li Kurdistana Iraqê têne kirin, daxwaza lêpirsînê bikin.

Ev tawanên şer in li dijî wan kesên ku di bin parastina navneteweyî de ne. Partiyên we dikarin projebiryaran bidin destpêkirin. Hikûmetên we dikarin bacên giran bixin ser rejîmê.

**3- Hevparî:** Me vexwînin nav karên xwe yên siyasî yên derbarê Îran, Rojhilata Navîn û veguhertinên demokratîk de. Pisporî û ezmûnên xwe bi partiya me û endamên me yên ciwan re parve bikin. Pisporên me ji bo mijarên girêdayî Îranê vexwînin. Mêvandariya çalakvanên me bikin. Dengê me bibîsin.

Tevgerê bi PDKÎ re ne wekî dozeke dûr û nenas nekin, belku wekî ku em kî ne me bibînin: Partiya we ya xwîşk, partiyeke sosyal demokrat a bi dîroka heştê salî ve, ku heman wê xebata ku hûn dikin dike, tenê li ser axeke dijwartir.

Komara Îslamî dê her hilweşe. Tenê pirs ev e ku kengê dê hilweşe û dê çi di şûna wê de ava bibe.

Alîkariya me bikin da ku em piştrast bin ku tiştê ava dibe demokratîk, federal û pluralîst be; ne tenê ji bo Kurdan, belku ji bo hemû Îraniyan û ji bo herêmê jî.

**Spas!**

**Jin, Jiyan, Azadî.**

## Mistefa Hicrî: Divê Ewropa ji bo rûxandina rejîma Îranê piştgir be



**Piştî nîvroya roja pêncşemê 27ê Xakelêweyê, birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê, li avahiya Parlamena Bêljîkê ji aliyê birêz Paul Magnette, Serokê Partiya Sosyalîst a Bêljîkê ve hat pêşwazîkirin.**

Di vê hevdîtinê de, di destpêkê de birêz Hicrî behsa dawîn pêşhatên navçeya Rojhilata Navîn û bi taybetî Îranê kir.

Birêz Hicrî got: ''Îran her çend di warên cuda yên siyasî û leşkerî de di lûtkeya lawaziyê de ye, lê di serkutkirin û îdamkirina xelkê Îran û Kurdistanê de, her wiha di êrîşên asmanî de bo ser binke û cihên me yên sivîl li Herêma Kurdistanê de çalak e.

Di vê rewşê de çaverêya me ji welatên Ewropî û bi taybetî ji partiyên wan ên pêşkeftinxwaz ev e ku piştgiriya partiyên Kurdistanê bikin.''

Kaka Mistefa di berdewamiyê de got: ''Em bawer in ku Îran heger bi lawazî jî bimîne, dê berdewam be li ser terorîzmê li derveyî welat; ji ber ku bingeha desthilatdariya wê li ser îdeolojiya tundrew û afirandina krîzan hatiye avakirin.

Encama kiryar û siyaseta wê jî bûye sedema wê yekê ku serwet û samana Îranê ji bo hinartina teror û hêzên niyabetî (proky) bê xerckirin. Bêguman heta niha jî rejîma Îranê gefeke bihêz e li ser ewlehiya welatên cîran û navçeyê.''

Hicrî: ''Em di van salên temenê rejîma Îranê de şahidê wê bûn ku Amerîka û Ewropa bi cidî rûbirûyî wê nebûne, lê niha xuya dike ku bi vê siyaseta xwe de çûne (siyaseta xwe guhertine).''

Her wiha Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat ragihand: ''Rêya çareseriya aramiyê ji bo Îran û navçeyê ew e ku Ewropa ji bo rûxandina vê rejîmê, ku daxwaza piraniya xelkê ye, piştgir be.''

Birêz Hicrî li ser girîngiya hevpeymanî û hevdengiyê, amaje bi Kongreya Neteweyên Îrana Federal û Hevpeymaniya Hizbên Kurdistana Îranê kir û got: ''Pêwîst e ev yekgirtin bi opozîsyona din a Îranî re jî hebe û girîng e Ewropa hevkarî bike ji bo birêxistina vê derfetê; wek nimûne rûniştina duh a parlamenê ku hewleke cidî û rast bû di vê çarçoveyê de.''

Birêz Paul Magnette, Serokê Partiya Sosyalîst a Bêljîkê, bixêrhatina vê serdana Mistefa Hicrî kir û amaje bi hewlên partiya xwe da daku bikaribin di çêkirina hevdengiyê de ji bo opozîsyona Îranê hevkariya pêwîst bikin.

Her wiha nîgeraniya xwe li ser binpêkirina mafên mirovan û berdewamiya îdamkirina girtiyên siyasî anî ziman û hêvî xwest ku ev dîtin û rûniştin ji bo birêxistina zêdetir a hevkariyan berdewam bin.

## Mistefa Hicrî: Divê civaka navdewletî nebe alîkarê avabûna dewleteke navendgera li Îranê

**Kak Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê (PDKÎ), di civînekê de ku li yek ji salonên Parlamena Ewropayê hat lidarxistin; rewşa siyasî ya Îran û Rojhilatê Kurdistanê û armanca xebat û têkoşîna Hizba Demokrat şîrove kir.**

Ev civîn roja çarşemê, 26ê Xakelêweyê bi beşdariya Daniel Attard, Cîgirê Nûnerê Derve yê Parlamena Yekîtiya Ewropayê bo Karûbarên Îranê; Xanim Evîn Incî, endama Parlamena Yekîtiya Ewropayê û herwisa komek ji parlamenterên partiyên Sosyalîst û Sosyal-Demokratên Yekîtiya Ewropayê birêve çû. Di wê civînê de nûnerên PDKÎ, Komelaya Şoreşger a Zehmetkêşên Kurdistana Îranê, Partiya Tezamuna Demokratîk a Ahwazê û Partiya Gelê Belûçistanê gotarên xwe pêşkêş kirin.

**Deqa axaftina Kak Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat di wê civînê de:**

**Birêzan!**

**Endamên parlamenê û beşdarên hêja!**

Di destpêkê de em spasî û pêzanînên xwe pêşkêşî organîzatorên vê civînê dikin ku derfeteke girîng ji bo nûnerên neteweyên cuda yên Îranê rexsandine; ewên ku hinek caran wek «kêmanî» navê wan tînin.

Lê di rastiyê de, li ser ax û herêma xwe ew piranî ne û xwediyên rastîn ên wan deveran in. Îran ne tenê yek netewe ye; belku ji çendîn netewe û nasnameyên cuda ku bi hev re di çarçoveya erdnîgariya siyasî ya Îranê de cih girtine. Îro li vir nûnerên van neteweyan amade ne da ku bîr û boçûnên xwe yên derbarê derbasbûna ber bi Îraneke demokratîk, federal û sekuler bînin ber bas.

Birêzan!

Tenê çavekî li beşdaran bigerînin: Dê diyar bibe ku Îran ne welatek e ku tenê xwedî yek ziman, yek çand, yek dîrok û yek nasnameyê be. Lê ji destpêka damezrandina dewleta nû ya Îranê ve, ev nasname hatine asmîlekirin û di bin siya serdestiya yek-neteweyî de mane.

Ji nêrîna me ya Kurdistanî û bi taybetî Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê ve, derbasbûna ber bi demokrasiyê li Îranê tu carî bi temamî nayê dîtin heta ku ew hemû nasname bi fermî neyên naskirin. Ev firehî (pluralîzm) nabe ku tenê wek «mafê kêmariyan» yan «mafê hemwelatîbûnê» were cihbicîhkirin. Divê nasnameya neteweyî ya hemû neteweyan bi fermî bê naskirin.

Neteweyên bindest di xebata xwe de berdewam in, lê ev xebat pêdivî bi têgihiştin û alîkariya civaka navdewletî heye. Divê civaka navdewletî careke din nebe alîkarê avabûna dewleteke serdest û navendî li Îranê.

Me li Kurdistanê, di çarçoveya «Hevpeymaniya Hêzên siyasî yên Kurdistana Îranê» de xwe birêxistin kiriye û em ê di xebata ji bo bidestxistina mafên xwe yên neteweyî de berdewam bin. Ji sala 2003yan ve jî me «Kongreya Neteweyên Îrana Federal» pêk aniye ji bo ku rûyekî rastîn û cuda ji Îranê nîşan bidin; rûyek ku firehneteweyî û firehçandiya vî welatî dixe ber çavan.



Lê di civaka navdewletî de hîn rûyên sexte yê «Îrana yek netewe û yek ziman» serdest e, ku tenê geşê bi cudakarî û nevekheviyê dide. Ji ber wê jî tu guhertineke rastîn nayê dîtin heger ev qorixçîtiya bi dawî nebe. Di nav hinek aliyên opozisyona Îranî de jî cehdek heye ji bo dubarekirina cureyekî din ji vê qorix kirna desthilatê piştî Komara Îslamî. Em wek Hizba Demokrat, ji bo dema 80 salan û bi taybetî piştî tevgera «Jin, Jiyan, Azadî» li dijî vê cehda nû sekinîn.

Guhertin li Îranê pêdivî bi eniyeke rengîn heye ku hemû nasname xwe tê de bibînin. Nexwe, dîsan desthilatdarîyeke din wek Komara Îslamî serhildide û dibe çavkaniya kêşeyan ji bo hemû cîhanê. Çavkaniya sereke ya gelek kêşeyên Îranê, qorixçîtiya kontrolnekirî ye. Ev qorix kirnane jî nayê kontrolkirin heger nasnameyên cuda bi fermî neyên naskirin û desthilatdarî vegere destê dewleteke medenî ku ne dewleta neteweyekê be, belku rêkxerê peywendiyên wan neteweyan be.

Di dawiyê de, ev cure civîn dikarin bibin destpêkek ji bo dîtina rastiya Îranê wek welatekî firehnetewe û firehnasname.

**Spasî we dikim**

# Daxuyaniya Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê li ser danûstandinên Amerîka û Komara Îslamî ya Îranê li Îslamabadê

Danûstandinên di navbera Dewletên Yekbûyî yên Amerîka û Komara Îslamî ya Îranê de li Îslamabada Pakistanê dest pê kirine. Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê bi hestiyarî çavdêriya pêvajoya van danûstandinan dike, danûstandinên ku ne tenê nîşaneya aştiyê nîn in, belkî xapandineke siyasî ya di asta navneteweyî de dubare berhem tîne.

Pêkhateya şanda Komara Îslamî tu gumanekê li ser mahiyeta rastîn a vê rejîmê nahêle: Pêkhateyeke ewlehî-leşkerî ku dîplomasiyê tenê wek amrazekê ji bo pêşxistina armancên xwe yên serkutker û destwerdanê bi kar tîne. Serpêreştiya vê şandê li ser milê Mihemedbaqir Qalîbaf e, ku wek yek ji fermandarên pilebilind ên Spaha Pasdaran û kesayetên sereke yên dezgeha serkut û geşepêdana leşkerî, di nav de projeyên navokî û mûşekî yên Komara Îslamî tê naskirin, ew wek sembola lihevketina eşkere ya desthilata leşkerî û siyasetê di vê pergalê de tê hesibandin.

Her wiha, beşdarkirina Mihemed Ceferî Sehrarûdî ku navê wî bi dosyeya terora Dr. Ebdulrehman Qasimlo ve hatiye girêdan û fermana girtina wî ya yasayî di asta navneteweyî de heye, tenê wek "tesaduf" nayê dîtin, belkî ev doktrîna fermî ya vê rejîmê nîşan dide ku tê de teror wek amraza siyaseta derve û "parastina ji darizandinê" (masûnîyet) wek bingeha sereke ya serdest bi ser pêkhateya desthilatê de tê dîtin. Rûniştina kesên bi vî rengî li ser maseya danûstandineke navneteweyî, sivakatiyeke eşkere ye bi şanda Amerîkayê, bi dadperweriyê, bi qurbaniyên terorê û bi kêmtirîn pênasên exlaqî û yasayî yên têkiliyên navneteweyî.

Ev şand, şandeke dîplomatîk nîn e, belkî berdewamiya toreke birêxistinkirî ya teror, kuştar, xapandin û operasyonên leşkerî yên li dervayî sînoran e. Danûstandin bi pêkhateyeke wisa re, ne tenê nabe sedema aştiyê, belkî bi wateya şeriyetdan bi siyaseta teror, dîlgirtin û binpêkirina sîstematîk a mafên mirovan tê, ji vî aliyê ve Amerîka ku bi xwe Spaha Pasdaran wek rêxistineke terorîst nas kiriye, rûbirûyê rexneyeke cidî dibe. Ezmûna çar dehên borî jî bi zelalî îspat kiriye ku Komara Îslamî danûstandinê ne ji bo çareserkirina qeyranan, belkî ji bo wextqezenckirin, nûkirina şiyanên xwe û berdewambûna li ser heman siyaseta xwe ya wêranker bi kar tîne.




Em bi eşkere radigihînin: Her cure peyman û muamileyek bi vê rejîmê re, bêyî liberçavgirtina bingeha lêpirsînê û bi fermî naskirina mafê qurbaniyan, wek beşdarbûn di berdewamiya neheqiyê de tê hesibandin. Civaka navneteweyî û dewletên demokratîk li beramberî bijardeyeke zelal in: An divê li rex û li pişta xelkê Îran û Kurdistanê û qurbaniyên teror û serkutê bisekinin, an jî li rex rejîmekê cih bigirin ku teror kiriye siyaseta xwe ya fermî.

Em daxwaz dikin ku di danûstandina bi Komara Îslamî re, şopandina yasayî ya kujerên terora dewletî, sepandina zextên siyasî yên bibandor û piştgirîkirina xebata xelkê Îranê ji bo azadî û dadperweriyê bibe bingeh. Her wiha aştiya rastîn li herêmê ne li ser maseya danûstandinê bi kujerên terorê re, belkî bi rêya dawîanîna bi parastina wan ji darizandinê, çespandina dadperweriyê û sernixûniya Komara Îslamî pêk tê.

**Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Desteya Kargêrî**
**11ê Nîsana 2026 an**

# Peyama Pîrozbahiyê ya Navenda Rêxistinên Sivîl bi Boneya 83 Saliya Damezirandina Yekîtiya Ciwanan




**Navenda Rêxistinên Sivîl ên Rojhilatê Kurdistanê bi boneya 83 saliya damezirandina Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Rojhilatê Kurdistanê peyameke pîrozbahiyê belav kir.**

**Deqa peyamê bi vê awayî ye:**

83 sal berê û di dilê guhertinên Şerê Cîhanî yê Duyem de, bi hewldan, hîmet û hişyariya komek ciwanên Kurd li bajarê Mehabadê, avakirina Komeleya Jiyaneweya Kurd (Jêkaf) bû xaleke werçerxanê ya tijî destkeft ji bo tevgera siyasî ya Kurdistanê. Yek ji destkeftên rêxistinî yên wê serdemê damezirandina "Sazmanî Cewananî Kurd" (Rêxistina Ciwanên Kurd) bû.

Avakirina Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Rojhilatê Kurdistanê û rola ciwanên Kurd di geşedana Komara Kurdistanê û destkeftên wê yên mezin de, bilind û berçav in.

Yekîtiya Ciwanan û rêxistina wê ya hevpişe û cemka wê, yanî Yekîtiya Jinan, û piştre damezirandina rêxistinên sivîl û pîşeyî yên din di herikîna tevgera mafxwazane ya Kurdistanê de, berhema aqiliyeteke giştgir a xebatê û beşdariya berfireh a komelên xelkê Kurdistanê ye ku Hizba Demokrat a Kurdistanê nûnertiya wê dike.

Geşebûna rêxistinên sivîl ên Kurdistanê di du-sê dehsalên dawî de û rola wan a bilind di birêkxistina civaka Kurdistanê de, ji aliyekê ve îsbatkerê geşepêdana hişyariya civakî û neteweyî ya civaka Kurdewarî ye, û ji aliyê din ve nîşana dûrbîniya birêvebirên Komara Kurdistanê û Hizba Demokrat e di rewşa tevgera Kurdistanê de.

Di rewşa niha ya xebata neteweyî ya xelkê Kurdistanê û guhertinên siyasî de, rola rêxistinên sivîl di birêkxistina hêz û şiyana ciwanan û çîn û tevên din ên civakê de pêwîst û berçav e.

Di vê peywendiyê de, Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Rojhilatê Kurdistanê wek kevintirîn rêxistina Kurdî, bêguman erkên girantir dikeve ser milê wê.

Navenda Rêxistinên Sivîl ên Rojhilatê Kurdistanê, tevî pîrozbahiyê li birêvebir û endamên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Rojhilatê Kurdistanê bi boneya 83 saliya damezirandina vê rêxistinê, serkeftin û berdewambûna wan di erkên vê qonaxa hestiyar de dixwaze.

**Navenda Rêxistinên Sivîl ên Rojhilatê Kurdistanê**
**21ê Xakelêweya 1405**

## Hewldanên Dîplomatîk ên Sekreterê Giştî yê Hizbê li Bruksel û Barselonyayê

Di hefteya borî de, Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat ji bo çendîn hevdîtin û civînên siyasî gihîşte Bruksela paytexta Beljîkayê û herwisa Barselonyaya li welatê Îspanyayê.

Birêz Mistefa Hicrî di hevdîtinên xwe yên dîplomatîk ên li Brukselê de, ligel berpirsên pilebilind ên Partiyên Sosyalîst ên Ewropayê civiya û li Parlamena Ewropayê gotarek pêşkêş kir.

Hevdîtin ligel xanim Iratxe García, Seroka Koma Sosyalîst û Demokratan; hevdîtin ligel Daniel Attard, Cîgirê Nûnerê Parlamena Ewropayê ji bo karûbarên Îranê; çavpêketin ligel Michael Gahler, Endamê Komîsyona Derve ya Parlamena Yekîtiya Ewropayê; hevdîtin ligel Paul Magnette, Serokê Partiya Sosyalîst a Belçîkayê û civîn ligel Evin Incir, Endama Parlamena Ewropayê, beşek ji hevdîtinên siyasî û dîplomatîk ên Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat li Bruksel û Parlamena Ewropayê bûn.

Ev serdan di rojên 25 heta 27ê Xakelêweya 1405an de pêk hat.

Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat piştre serdana Îspanyayê kir û di civîna cîhanî ya Sosyalîstên Ewropayê de beşdar bû.

Di vê konfiransa cîhanî de ku bi beşdariya nûnerên 70 welatan bi rêve çû, birêz Mistefa Hicrî li ser rewşa siyasî ya Îran û Kurdistanê gotarek pêşkêş kir.

**Sekreterê Giştî yê Hizbê herwisa ligel hejmarek kesayetiyên siyasî yên pilebilind ên Ewropayê hevdîtin pêk anîn, wek: Stefan Löfven, Serokê Partiya Sosyalîstên Ewropayê; Evin Incir û Andreas Schieder, du parlamenterên Ewropayê; û herwisa Giacomo Filibeck, Sekreterê Giştî yê Partiya Sosyalîstên Ewropayê.**




Her di qiraxa vê civîna lûtkeyê de, Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat ligel çendîn kesayetî û rêberên siyasî yên welatan civiya, wek: Mihemed Şitaye, Serokwezîrê berê yê Filîstînê; Conner Rousseau, Serokê Partiya "Vooruit" a Beljîkê; Tülay Hatimoğulları, Hevseroka DEM Partiyê û Srdjan Milivojević, Serokê Partiya Demokrat a Sirbîstanê.

Hevdem ligel van hevdîtinên siyasî, birêz Mistefa Hicrî ligel medyayên cîhanî yên wek TVe, Europa Press û La Sexta hevpeyvîn û çavpêketin encam dan.

## Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê: Sazşkirina bi Tehranê re Rêxweşkirine ji bo zêdebûna Teror û Bêîstîkrariyê




**Bo raya giştî û navendên navneteweyî!**

**Ber bi nûnertiya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî li Iraq û Herêma Kurdistanê!**

**Ber bi Hikûmeta Federal a Iraqê!**

Rejîma terorîst a Komara Îslamî ya Îranê, bi mebesta veşartina şikestên xwe yên siyasî, leşkerî û stratejiyên îdeolojîk di dema şerê 39 rojî yê ligel Amerîka û Îsraîlê de, bi berdewamî êrîşî ser bingeh û baregehên hizbên Rojhilatê Kurdistanê û kampa niştecihbûna malbatên kadro û pêşmergeyên wan li Herêma Kurdistanê kiriye. Tevî ku niha agirbest heye jî, ew êrîş her berdewam in. Di nûtirîn êrîşê de ku roja borî 28ê Xakelêweya 1405 bi mûşek û dronan kirin ser kampên sivîl û baregehên Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê; mixabin 3 pêşmerge û têkoşerên rêya azadiyê bi navên Şahîn Azarberzîn, Neda Mîrî û Semîra Ellahyarî şehîd bûn û 2 pêşmergeyên din jî birîndar in.

Komara Îslamî ya Îranê berê jî ji bilî bingeh û baregehên hizbên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê û cihê niştecihbûna malbatên wan, bi berdewamî êrîşî ser Herêma Kurdistanê kiriye ku mixabin di wan êrîşan de 11 kes şehîd û qurbanî bûn.

Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê, tevî şermezarkirina tund a vê tawane û hemû êrîşên terorîstî yên Komara Îslamî yên li ser têkoşerên Rojhilat û şehîdkirina 10 têkoşerên hizbên endam ên hevpeymaniyê, radigihîne:

Rû bi hikûmeta Iraqê ve radigihînin: Pêwîste helwest û bertekên wan ên cidî hebin û gavên pratîkî, yasayî û eşkere bihavêjin ji bo parastina canê penaberên siyasî û rêgirtin li dubarebûna van tawanan. Parastina serweriya xak û giyanê niştecihên Herêmê, erkekî destûriye; bi taybetî ku ew Komara Îslamî ya Îranê ku rêkeftina ewlehiyê ya navbera her du welatan binpê kiriye.

Rexneyên tund li nûnertiya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (UN) li Iraq û Herêma Kurdistanê digirin: Em di wê baweriyê de ne ku bêdengî û pasîvmayîna wan li hember van tawanên şerî û piştguhxistina erkên wan ên mirovî, destê rejîma Tehranê ji bo destdirêjî û terora zêdetir vekiriye. Em daxwaz dikin ku ev êrîş wek tawana şer û terora navneteweyî werin naskirin, tomarkirin û helwest li ser werin girtin.

Bi tundî rexne li siyaseta lihevkirin û bazarkirina welatan ligel Komara Îslamî digirin: Em tekeziyê li ser wê rastiyê dikin ku vê rejîma dîktator ewlehî û aramiya hemû cîhanê kiriye rehîn û her dem danûstandin û saziş bi civaka navneteweyî re ji bo kirîna demê bo pêşxistina armancên xwe bi kar aniye. Lewma dema wê hatiye ku Encumena Ewlekariya Neteweyên Yekbûyî bertekek bilez nîşan bide û civaka navneteweyî bi sazişkirina ligel Tehranê re êdî destê rejîmê ji bo berdewamiya teror û kuştarê vekirî nehêle.

Daxwaz ji hemû Kurdên li derveyî welat dikin: Bi plan û bernameyên bi hêz, bi rêxistinkirina aksiyon û meşên aştiyane bi şêweyekî berdewam werin ser şeqaman. Li ber balyozxane, konsulxaneyên rejîmê û navendên biryardanê bicivin û dengê nerazîbûna neteweya me bilind bikin.

Di dawiyê de, Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê careke din dost û dijminan piştrast dike ku ev êrîş û qurbaniyên hêzên me, ne tenê îradeya me nahejînin, belkî baweriya me ya bi rewayiya xebata ji bo rizgariya Kurdistanê û rûxandina vê rejîmê û bi biryardariya me ya li ser berdewamiya xebatê hîn qahîmtir dike.

**Nemirî bo şehîdan û serkeftin bo rêya azadiyê.**

**Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê**

**17ê Nîsana 2026 an a Zayînî**

## Nerîna Lîderan



**“Mistefa Hicrî”:**

**“Bi vê rejîmî re dîplomasiya bêdeng nekin, çimku şerîyetê didê”**



**“Mesrûr Barzanî”:**

**“Divê nifşên me bizanibin ku destkeftiyên me yên niha ne bi hêsanî hatine bidestxistin”**



**“Donald Trump”:**

**“Rejîma Îranê êdî nikare ji Amerîkayê bacan werbigire”**




**“Hakan Fidan”:**

**“Vekişîna Amerîkayê ji NATOyê dê ji bo Ewropayê wêranker be”**

# Başûrê Kurdistanê, lîstikvanek ku êdî di hevkêşeya petrol û siyaseta cîhanî de nayê paşguhxistin



N. Eskender Ceiferî



Di salên dawî de, navê Başûrê Kurdistanê ji her demê bêtir li kêleka têgehên wekî wize, bazara cîhanî ya petrolê û pêşbaziya jêopolîtîk hatiye baskirin.
Geşedanên têkildarî henardekirina petrolê li herêmê, bi taybet di dema serokatiya Donald Trump de, nîşan dane ku Kurdistan êdî ne tenê lîstikvanek herêmî ye, lê di heman demê de bûye beşek ji hevkêşeyên mezintir li ser asta navnetewî.
Nêrîna Waşingtonê li ser vê herêmê ne tenê ji ramana ewlehiyê lê di heman demê de ji dîtingeha dabînkirin û rêkxistina bazara wizeya cîhanî jî pêk hatiye.
Başûrê Kurdistanê bi petrola xwe bûye yek ji xalên hilberîna herî girîng a wizeyê li Rojhilata Navîn. Petrola Kerkûk û deverên din yên Başûrê Kurdistanê xwedî bandora hevsengiya dabînkirinê di bazara cîhanê de ne.
Girîngiya van çavkaniyan dema ku em bala xwe didin rêyên henardekirina wê, bêtir eşkere dibe; Kurd bi boriya ji vê herêmê ber bi Tirkiyê û berava Ceyhanê ve dibin girêdanek sereke di zincîra dabînkirina petrolê de. Ev taybetmendî bûye sedem ku herêm, tevî statuya xwe ya taybet, bi bandor û rola xwe weke lîstikvanek serbixwe di bazara wizeyê de bê hejmarkirin.
Di dema serokatiya Trump de, siyaseta zexta herî zêde li dijî Îranê bû sedem ku Amêrîka li pey çavkaniyên altêrnatîv be da ku kêmbûna henardekirina petrola Îranê qerebû bike.
Di vê çarçoveyê de, hewildan ji bo destpêkirina dubare ya henardekirina petrolê ji Kurdistanê wekî beşek ji stratêjiyeke berfirehtir tê dîtin. Ev nêzîkatî nîşan dide ku Kurdistan ji hêla siyasetmedarên Amêrîkî ve ne tenê wekî hevalbendek herêmî lê di heman demê de wekî lîstikvanek girîng di rêkxistina bazara cîhanî ya petrolê de tê hesibandin.
Ji bo ku girîngiya vê rolê çêtir bê fêmkirin, mirov dikare basa yek ji astengiyên wizeyê yên herî hestyar li cîhanê wate Tengava Hormuzê bike. Ev tengav, ku beşek girîng ji petrola cîhanê ji wêderê derbas dibe, her gav rastî aloziyên jêopolîtîk hatiye. Demên ku Îranê gefa girtina wê tengavê an jî trafîka tankêran dikir, bazara cîhanî ya petrolê bi tundî rastî guhertinê hat û biha zêde bûn. Di rewşên weha de, girîngiya çavkaniyên altêrnatîv û rêyên din yên henardekirinê, ji her demê bêtir eşkere dibe.
Li vir rola Herêma Kurdistanê bêtir derdikeve. Berevajî rêyên deryayî yên ku aloziyên Kendavê bandorê dikin ser wan, petrola Kurdistanê bi rêya boriyên bejayî ber bi berava Ceyhanê li Tirkiyê ve tê veguhastin.
Her çend pirsgirêkên siyasî yên vê rêyê jî hene, lê ji Tengava Hormuzê gelek aramtir e. Ji ber vê sedemê, dema ku derbasbûna petrolê di Tengava Hormuzê de sînordar an rawestyayî be, Herêma Kurdistanê dikare wekî çavkaniyek altêrnatîv bê dîtin da ku beşek ji pêwîstiyên bazara cîhanî dabîn bike.
Ev ne tenê ji bo daxwazkerên wizeyê yên wekî Ewropa û Rojhilata Navîn, lê di heman demê de ji bo kompaniyên navnetewî yên petrolê jî girîng e. Gelek ji van kompaniyan dixwazin çavkaniyên dabînkirinê hebin da ku metirsiyên ku ji kirîzên herêmî çê dibin, kêm bikin. Hebûna wan kompaniyan li Herêma Kurdistanê û veberhênana wan di projeyên petrolê de li Herêmê nîşan dide ku baweriya wan bi şiyana dabînkirina domdar a wizeyê li Kurdistanê heye.
Lêbelê, helwêsta Kurdan di vê hevkêşeyê de carna ji hêla siyasî ve rastî pirsgirêkê hatiye. Nakokiyên demdirêj di navbera hikûmeta navendî ya Îraqê li Bexdayê bi hikûmeta Herêma Kurdistanê re li ser kontrola çavkaniyan û belavkirina dahatên petrolê yek ji astengiyên sereke yên ji bo damezrandina vê rolê bûne.
Ev nakokî carna bûne sedema rawestandina henardekirina petrolê û têkçûna bazarê, ku nîşan dide aramiya navxweyî çiqas girîng e ji bo lîstina hebûna roleke cîhanî.
Herwisa girêdayîbûna bi rêya henardekirinê ya bi Tirkiyê re faktorek din e ku Herêmê rastî zextên jêopolîtîk tîne. Têkiliyên di navbera Hewlêr û Enqerê de, û herweha têkiliyên Tirkiyê ligel Bexdayê û lîstikvanên din li navçeyê, dikare rasterast bandorê bike ser henardekirina petrola Kurdistanê. Ji ber vê yekê, Kurd neçar in ku berjewendiyên xwe bi berçavgirtina aktorên herêmî û navnetewî re hevseng bikin.

Ji aliyekî din ve, rola Başûrê Kurdistanê di aboriya cîhanî de tenê bi henardekirina petrola xav ve sînordar nîn e. Ev herêm dikare di pêşerojê de bibe navendek ji bo palawtina petrolê, petrokîmî û veguhestina wizeyê.

Pêşxistina pêşesaziya wizeyê, kişandina veberhênana biyanî û afirandina çarçoveyên yasayî yên zelal di nav wan faktoran de dikare vê girîngiyê xurt bike. Di rewşek wisa de, Başûrê Kurdistanê ne tenê wekî henardekarek petrolê, lê di heman demê de wekî navendek wizeyê li herêmê jî tê dîtin.
Ji bilî mijara aborî, rola ewlehiyê ya Kurdan jî bûye alîkar ku pêgeha wan xurt bibe. Di salên dawî de, ew wekî yek ji hêzên bejayî yên herî girîng di şerê li dijî DAIŞ'ê de hatine naskirin, û vê rolê, pêgeha siyasî ya wan li ser asta navnetewî xurt kiriye. Têkilbûna vê rola ewlehiyê bi şiyana aborî re, bi taybetî di mijara petrolê de, Başûrê Kurdistanê kiriye lîstikvanek piralî li herêmê.
Bi giştî, pêşketinên salên dawî nîşan didin ku Başûrê Kurdistanê êdî ne tenê herêmek erdinîgarî ye, lê di heman demê de bûye pîvanek bi bandor di hevkêşeyên wize û siyasî yên cîhanî de. Dema ku di asta cîhanê de ewlehiya wizeyê ji her demê girîngtir bûye û rêyên veguhestina petrolêyên berê rastî gefê tên, herêma Kurdistan dikare bandorê li ser bazara cîhanê bike.

**Di hejmara vê carê ya Rojnameya Agirî, me digel Bîrkar û lêkolîner, Mamoste Huseyn Qenber, Rêveberê Navenda Lêkolînên Rojhilatê bo Aştî û pêywendiyên navnetewî, li ser pêvajoya danûstanên Îran û Amerîkayê û dorpêçên deryayî yên Amerîkayê bo ser Îranê hevpeyvîn encam daye.**



Hevpeyvîn: Huseyn Qenber




**Hevpeywînkar: Sîmîn Rûhanîzadeh**

**1- Dîtingeha we li ser şikesta danûstanên di navbera Amerîka û Îranê çiye bi nêrîna te gehiştine bunbestek rastîn, yan hêj rê heye û dikarin carek din bizivirine ser mêseya danustanê?**

Di çarçoveya têoriya siyaseta navnetewî de, şikesta danûstanên di navbera Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Îran de divê ne wekî bunbestekî dawîn, lê wekî qonaxekî di nav pêvajoya dirêj a “şerê sînorî yê stratejîk” de were şirove kirin.

Ev şer, ku di navbera her du hêzên herêmî û cîhanî de tê birin, di eslê xwe de şerekî hybrid e ku li ser gelek astên siyasî, aborî, û leşkerî diheje.

Li gorî nêrîna realist a di nav International Relations de, danûstan bi xwe ne armanc in, lê amûrek in ji bo bidestxistina şertên baştir.

Ji ber vê yekê, şikesta wan ne tê wateya ku deriyê çareseriyê hatiye girtin, belkî nîşan dide ku şertên îdîal ji bo gihîştina lihevhatinê hêj ne amade ne.

Her çend ku her du alî di gotarên xwe de li ser zext û gefan radikevin, lê logîka parastina berjewendiyên neteweyî û têkçûna potansiyela şerê fireh wan bi zor vedike ku di demekê de vegerin ser maseya danûstanê.

Di vê çarçoveyê de, dikare were gotin ku em li hember “bunbesta taktîkî” ne, ne “bunbesta stratejîk”.

**2- Li dîtingeha têuriya pêwendinyên navnetewî ve dorpêçên deryayî ku ji aliyê Amerîkayê ve destpêkirine dikare weke kontirola kirîzan bibînîn yan weke pêngavek bo destpêka şer?**

Dorpêçên deryayî yên ku ji aliyê Amerîkayê ve hatine destpêkirin, di bin têgihiştina stratejîk de dikarin wekî pêkanîna siyaseta “deterrence” were şirove kirin; yanî hewldan ji bo rêgirtina Îranê ji kiryarên ku li dijî berjewendiyên Amerîkayê û hevalbendên wê ne.

Lê belê, ev pêngav di heman demê de di nav xwe de rizîkekî bilind hildigire: veguherîna krîzê ji asta kontrolkirî bo asta ne kontrolkirî.

Dîrok nîşan dide ku şertên wekî dorpêçên deryayî gelek caran bûne pêşengiya şer, ji ber ku herî kêmtir çalakiyên taktîkî dikarin bibe sedema bersiva leşkerî ya mezin.

Di vê çarçoveyê de, şertên niha dikarin di navbera du modelan de bimeşin: yekem, modela kontrolkirina krîzê (crisis management) ku li ser rêgezên ne nivîsî yên şerê sînordar tê damezrandin, û duyem, modela eskalasyona pêşveçûnê ku li ser zencîreyekî bersivên berdewam tê avakirin.

**3- Bi berçavgirtina gefên her du aliyan yanî Îran û Amerîka bi taybetî piştî destpêkirina dorpêçên deryayî û zêdebûna gefan, helwêst û pêngava welatan bi taybetî welatên “G7” di paşerojê de yê çawa be?**

Welatên G7 di rewşên weha de bi gelemperî hewl didin ku wekî aktorên balansker xuya bibin. Armanca wan ne tenê parastina aramiya herêmî ye, belkî jî parastina stabîlîta pergala aborî ya cîhanî ye.

Di perspektîva stratejîk de, G7 dikare sê rolan bilîze:

Rola zextê: bi zêdekirina giwaşên aborî û siyasî li ser Îranê;

Rola navbeynkarîyê: bi pêşkêşkirina platformên nû ji bo danûstanan;

Rola piştgirîya şertî: bi dayîna piştgirîya stratejîk bo Amerîkayê, lê bi şertên ku şerê fireh nehêle.

Ji ber vê yekê, siyaseta G7 ê di navbera du armancan de balans bike: rêgirtina eskalasyonê û parastina hejmoniya nîzama navnetewî ya heyî.

**4- Bandora aboriya wan aloziyane weke ku em dizanin cîhaniye bi nêrîna te giwaşên aborî di niha de dikare çi bandorekê li ser rejîma Îranê danê bi taybetî di vê rewşa ku niha dinav deye û gevriya Hormozê weke karta giwaşê bikar tîne?**

Aloziyên niha bi taybetî li ser pergala enerjiyê ya cîhanî bandorên girîng hene, ji ber ku Gevriya Hormozê yek ji girêdanên sereke yên şandina neftê ye.

Her guhertinek li ser vê herêmê dikare rasterast li ser bihayên bazarên cîhanî bandor bike.

Îran bi şêwazekî stratejîk vê gevriyê wekî amûrekî zextê bikar tîne; ev jî nîşan dide ku gelek caran aktorên herêmî dikarin “cografiyayê” veguherînin “hêza siyasî”.

Ji aliyê din ve, giwaşên aborî li ser Îranê, her çend ku bandorên giran li ser aboriya navxweyî dane, lê nekarîne rejîmê bi temamî bixe bin zexta stratejîk.


Ev yek ji ber ku Îranê hewl daye ku bi modela “resistance economy” xwe li hember zextan biparêze û pêywendiyên xwe bi hêzên din yên cîhanî fireh bike.

Di encamê de, aloziyên niha şertên nû yên lîstika hêzê diafirînin, ku tê de aborî, jeopolîtîk û leşkerî bi hev ve girêdayî ne, û her yek dikare li ser yê din bandorê dabinê.

**Gelek spas Mamoste Huseyn Qenber**

# Komara Îslamî Versiyona 2.0




N. Dr. Mecîd Heqî

Em îro li nuqteyekê sekinîne ku dûmana şerê çilrojî ketiye û cesedê fîzîkî û manewî yê Elî Xaminêyî û beşekî mezin ji kadroyên teokrasiya desthilatdar, di bin kavilên vê pevçûnê de hatine veşartin. Lê tiştê ku di vê serdema “agirbesta hejok” de tê dîtin, ne veguherînek dumoqratîk e, belkî jidayikbûna cinawirekî ye ku ez jê re dibêjim “Komara Îslamî; Versiyona 2.0”.

Di demekê de ku Donald Trump û Qesra Spî bi xeyalên xweş behsa “guhertina reftarên rejîmê” û “encamên daxwazkirî” di danûstandinên Îslamabadê de dikin, ezmûna gelên Îranê ku bi dehsalan e istibdada navendparêz dîtine, bi temamî cuda ye.

Di versiyona 1.0 de bi rêberiya Xumeynî û Xaminêyî, em rûbirûyî sîstemekê bûn ku meşruiyeta xwe di navbera “Xwedê” (Wîlayeta Feqîh) û “sindoqên dengdanê yên endezyarkirî” de parve dikir. Lê di versiyona 2.0 de, perde hatine hildan. Di vê versiyonê de rejîma Îranê ji “teokrasiyeke olî” veguheriye “Pratoriyanîzmeke Leşkerî” (desthilatdariya mutleq a leşkeran).

Spaha Pasdaran ku berê di bin siyê de tevdigeriya, niha hemû şeryanên aborî, dîplomatîk û leşkerî girtine destê xwe. Di vê binyadê de, Mojteba Xaminêyî heger sax bimîne û li ser text rûnê jî, dê tenê bibe “Welîfeqîhekî merasîmî” û qels ku wezîfeya wî rewakirina formalîte ya ji bo desthilata mutleq a serdaran e. Şanoya hilbijartinê ku rojekê kesên mîna Pezeşkiyan hildiberandin, di versiyona 2.0 de tenê dê bibe komediyeke tal ji bo xapandina civaka navneteweyî.

Danûstandinên Îslamabadê, peymanekê tîne bîra mirov ku mafên neteweyên Îranê li ber lingên “îstîqrara herêmî” qurban dike. Washington li pey rejîmeke “pêşdîtî” (predictable) ye, ne mecbûrî demokratîk. Heger bendewariyên Amerîkayê pêk bên û Supayê Pasdaran dest ji gefa hebûnî ya li ser Îsraîlê berde, em ê rûbirûyî rejîmekê bibin ku çavkaniyên wê yên darayî dîsa tije dibin.

Lê ev çavkanî ji bo refaha Kurdistan, Belûçistan an Erebistanê (Ahwaz) nayên xerckirin. Ev dewlemendî dê ji bo nûjenkirina makîneya serkutkirinê were bikaranîn ku di Rêbendana 1404an de, bi deh hezaran zarokên me xistin nav xwîn û axê. Aştî bi Rojava re ji bo vê rejîmê, tê wateya wergirtina çira kesk ji bo “şerekî navxweyî yê berfireh” li dijî neteweyên bindest.

Sîstemên siyasî yên li ser bingehê jêbirin û tunekirinê ne, bi xwezaya xwe tûşî “rizîna binyadî” dibin. Heger ez bixwazim lîteratûra kompîturê bikar bînim, ez bawer im versiyona 2.0 ya Komara Îslamî, tevî hemû xemlandinên dîplomatîk, xwedî “bagên” (bugs) kûr e ku heta procesorên herî bihêz ên ewlehiyê yên Pasdaran jî nikarin wan çareser bikin.

Ev sîstem hewl dide xwe “dîbag” (Debug) bike; yanî bi rakirina hêmanên acizker (wek baskê olî yê klasîk an îslahatxwazên hikûmetî) bigihîje îstîqrareke hesinî. Lê baga (kêmasiya) sereke, “krîza meşruiyetê” û “pirsa neteweyî” ye. Rejîma ku bi komkujiya 10ê Rêbendana 1404an hatiye imidkirin, êdî tu pireke peywendiyê bi civakê re nemaye. Deryaya xwînê ya ku di navbera desthilat û gelên Îranê de çêbûye, her hewleke ji bo îstîqrarê di versiyona 2.0 de ber bi têkçûnê ve dibe. Ev sîstem li hemberî daxwazên me yên nasnameyî, ji bilî çekê tu zimanekî din nizane û ev tunebûna zimanê diyalogê, dê bibe sedema “keraş” (Crash) ango hilweşîna wê ya dawî.

Bûyerên Rêbendana 1404an ji bo min, xala venegera dîroka hevdem a Îranê ye. Rejîma ku ji bo man û mayîna xwe di versiyona 2.0 de, devê xwe bi xwîna gelên xwe vekir, di rastiyê de gora xwe kola.

**Ji bo me li Kurdistanê, ev dirindeyî diyardeyeke nû nîn e, lê rûbera vê komkujiyê nîşan da ku rejîm di versiyona xwe ya nû de, “terorîzma dewletî” kiriye stûna sereke ya man û mayîna xwe. Ev rejîm heta heger bi Amerîkayê re li hev bike jî, li hemberî daxwaza gelên Îranê (bi taybetî neteweyên bindest ku herî zêde barê cudakariyê hilgirtine) rawestiye û ev nakokî, dê bibe motora hilweşîna wê.**

Ji nêrîna tevgera rizgarîxwaza Kurdistanê, divê em ne tenê temaşevanên peymana Washington û Pasdaran li Îslamabadê bin. Asoya me ya stratejîk divê li ser sê stûnan ava bibe:

**-Yekem:** Eşkerekirina rûyê faşîst ê versiyona 2.0; divê em bidin famkirin ku ev rejîm “neguheriye”, belkî hatiye “safîkirin” (purified) da ku hovtir bibe.

**-Duyem:** Girêdana navbera derdor (periferî) û navendê; hêza me ya rastî di hevgirtina daxwazên dumoqratîk ên navendê bi daxwazên neteweyî-nasnameyî yên li Kurdistan, Belûçistan û deverên din de ye. Versiyona 2.0 ji vê yekîtiyê ditirse.

**-Sêyem:** Amadekarî ji bo kêliya “dîbaga” dawî; wek min got, ev sîstem ji ber nakokiyên xwe yên hundurîn zû yan dereng dê tûşî sekinîna dil bibe. Divê em binyadên xwe yên xwerêveberiyê ji bo wê kêliyê amade bikin.

Komara Îslamî versiyona 2.0, hewildaneke bêhêvî ya leşkeran e ji bo kirîna demê. Lê rastî ev e ku ev versiyon, (update) ango nûkirina dawî ye. Sîstemek ku tenê bi xwîn, serkutkirin û peymana bi hêzên biyanî re sax e, nikare li hemberî vîna neteweyên bindest ku li pey mafê diyarkirina qedera xwe ne, li ber xwe bide.

Pêşeroja Îranê li Îslamabadê diyar nabe; pêşeroj di kolanên Urmiye, Mehabad, Sine, Zahedan û Ahwazê de ye, û di yekîtiya me ya ji bo bidawîanîna sedsalek ji istibdada navendparêz de veşartî ye. Versiyona 2.0 ji ya ku tê xeyalkirin lerziztir e; em tenê divê amade bin da ku di kêliya guncav de, vê pergala bidirûn (full of bugs) ji bo her tim ji rûpelên dîrokê rakin.

# Krîza jîngehê li Îranê: Dema ku av û hewa dibin pirseke siyasî



N. Sefiye Xalidî



Krîza jîngehê li Îranê ji ber rewşa niha her ku diçe dibe yek ji pirsgirêkên herî girîng ên welêt û êdî ne tenê pirsgirêkek ekolojîk e.

Kêmbûna avê, qirêjiya hewayê ya zêde û qutbûna elektrîkê ya dubare bandorê li jiyana rojane ya mirovan dike û dibe sedema zêdebûna nerazîbûna raya giştî Kêmbûna avê ji bo gelek herêman dibe sedema pirsgirêkên mezin.

Çem zuha dibin, gol kêm dibin an jî bi tevahî winda dibin, û hin bajar bi rêkûpêk kêmbûna ava vexwarinê dijîn.

Sedem guherîna avhewayê, hişkesaliyên dirêj, û di hin rewşan de, polîtîkayên avê yên nebaş in.

Ji bo gelek cotkaran, ev tê wateya windakirina debara wan, ji ber ku zevî êdî bi têra xwe nayên avdan.

Qirêjiya hewayê jî pirsgirêkek cidî ye, nemaze li bajarên mezin ên mîna Tehranê.

Duman bandorek neyînî li ser tenduristiya giştî dike û dibe sedema sînordarkirina jiyana giştî.

Wesayîtên kevin, emisyonên pîşesaziyê û cihê erdnîgarî yê bajaran rewşê hîn xirabtir dikin.

Herwiha, ji ber kêmbûna enerjiyê û bargiraniya giran a li ser binesaziyê, qutbûnên elektrîkê yên dubare çêdibin. Ev qutbûn bandorê li malbatan û karsaziyan dike.

Dema ku şer di demek de dirêj berdewam be, zehmetiyên aborî yên welêt girantir dike.
Pirsgirêkên jîngehê demek dirêj e ku aliyên siyasî girtine.

Xelk her ku diçe zêdetir derdikevin kolanan da ku li dijî kêmbûna avê, wêrankirina jîngehê û şert û mercên jiyanê nerazîbûnê nîşan bidin.

**Ev yek bi awayekî zelal nîşan dide ku krîza jîngehê li Îranê ne tenê meseleya parastina xwezayê ye, lê di heman demê de faktorek sereke ya aloziyên civakî û bêîstîqrariya siyasî ye jî.**

Ji ber vê yekê, pêşeroja welêt dê girêdayî wê yekê be ka gelo çareseriyên domdar ji bo van pirsgirêkên jîngehê dikarin werin dîtin an na.

Di heman demê de, pirsgirêkên jîngehê rewşa aborî ya jixwe aloztir dikin: têkçûna çandiniyê, astengiyên hilberînê û zêdebûna lêçûnên jiyanê gelek kesan ber bi xizaniyê ve dibin.



Dema ku av kêm dibe, enerjî kêm dibe û biha bilind dibin, beşên herî xizan ên nifûsê bi taybetî xeternak in.

Bêyî tedbîrên bibandor, welat ne tenê bi krîzek ekolojîk re rû bi rû dimîne, lê di heman demê de bi krîzek aborî û civakî ya kûr re jî rû bi rû dimîne ku dikare aramiya wê bêtir bixe xeterê.
Ji bo pêşîgirtina li vê meylê, tedbîrên berfireh pêwîst in.

Ev, berî her tiştî, polîtîkayeke jîngehê ya domdartir dihewîne, mîna bi rêya rêveberiya avê ya bi bandortir, parastina çavkaniyên xwezayî û berfirehkirina enerjiyên nûjenkirî.

Di heman demê de, hevkariya navneteweyî ya bihêztir dikare bibe alîkar ku pisporiya teknîkî û piştgiriya darayî bîne welêt.

Veberhênanên armanckirî di kar, binesazî û xizmetên giştî de jî dê ji bo têkoşîna li dijî xizaniyê û îstîqrara aboriyê girîng bin.

Lêbelê, di dawiyê de, serkeftina tedbîrên weha bi vê yekê ve girêdayî ye ku gelo biryarderên siyasî amade ne ku bi cidî pirsgirêkên heyî çareser bikin û çareseriyên demdirêj bicîh bînin.

Bersiv gelek zelale, ku rijêma Îranê têk neçe,çi çareserîyek di tu warî de tune!

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Êrişa li ser kampên Hizba Demokrat: 3 şehîd û çend birîndar hene




Êrişa dronî ya Komara Îslamî ya Îranê bo ser kampên sivîl ên Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê (PDKÎ) li Herêma Kurdistanê, bû sedema şehîd û birîndarbûna çend kesan.

Komara Îslamî ya Îranê piştî nîvroya roja Înê, 28'ê Xakelêweyê, bi mûşek û dronan pêleke nû ya êrişan kire ser kampên sivîl ên Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê.

Di encamê de bav û kurek bûn qurbanî; di vê êrişê de Şahîn Azerberzîn şehîd bû û bavê wî bi nave Nadir Azerberzîn bi giranî birîndar bû.

Herwisa di êrişeke din de bo ser komek ji pêşmergeyên Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê, 2 pêşmergeyên keç bi navên Neda Mîrî û Semîra Ellahyarî şehîd bûn û çend pêşmergeyên din jî birîndar bûn

## Bi sedema êrîşa dronî a rejîmê pêşmergeyeka Komeleya Zehmetkêşên Kurdistanê şehîd bû



Xezal Molan, pêşmerge ya Komela Zehmetkêşên Kurdistanê, ku di encama bordûmanên êvara roja Sêşemê ya Spaha Terorîst a Pasdaran de bi giranî birîndar bibû, şehîd bû.

Roja Sêşemê 25ê Xakelêvê, Komara Îslamî di berdewamiya êrîşên xwe de bo ser kampên hizbên Rojhilatê Kurdistanê, bi dronan êrîş kire ser kampên "Azadî" ya Hizba Demokrat û "Sûrdash" a Komelay Zehmetkêşan; di encamê de 3 pêşmergeyên Komelay Zehmetkêşên Kurdistanê birîndar bûn.

Xezal Molan yek ji wan birîndaran bû ku ji ber giraniya birîna xwe şehîd bû.

Komara Îslamî ya Îranê ji destpêka şerê bi Amerîka û Îsraîlê re, bi dehan caran êrîş kiriye ser kamp û baregehên hizbên Rojhilatê Kurdistanê û heta niha bi zêdetir ji 110 mûşek û dronan, kampa malbatên Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê û navendên dermanî û perwerdehiyê yên vê hizbê kiriye armanc.

## Cezayê Sêdarê û Girtîgehê li ser Pênc Xwenîşanderan hat sepandin



Di berdewamiya pêla serkutkariyên dezgeha bi nav dadwerî ya Komara Îslamî ya Îranê de, çiqa 26ê yê Dadgeha Înqilaba Têhranê cezayên giran li ser pênc welatiyên girtî yên xwenîşandanên meha Befranbarê de sepand.

Çar welatî bi navên "Mihemedreza Mecîdî Esil", "Bîta Himetî", "Bêhrûz Zemanînejad" û "Koroş Zemanînejad", bi tohmeta "çalakiyên têkderane li dijî rejîmê û hevkariya bi dewletên dijmin û komên dijber re" cezayê sêdarê (îdamê) li ser wan hat sepandin.

Ev kesane ji bilî sêdarê, bi tohmeta "civîn û lihevhatin li dijî ewlehiya Îranê" cezayê 5 sal girtîgeh û destbiser de girtina hemû mal û milkên wan wekî cezayê temamker li ser wan hat sepandin.

Herwisa "Emîr Himetî", tometbarê pêncemîn, bi giştî cezayê 5 sal û 8 meh girtîgehê li ser hat sepandin.

Dadgehê bêyî pêşkêşkirina tu belgeyên hûr, hinceta van cezayan vegerand bo beşdariya di nerazîbûnan de û îdiaya bikaranîna çekên nenas.

Ev di demekê de ye ku rapor amaje bi wê dikin ku ev welatî di bin îşkenceyên giran ên cesteyî û derûnî de bûne ji bo wergirtina îtîrafên bi zorê, û di tevahiya pêvajoyê de ji mafê hebûna parêzer hatine bêpar kirin.

# Agirî


- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (516)